

Daxuyanî ji bo raya giştî

Yasayên taybet û yasaya penaberîyê û pêkanîna wê di çerçeveyeke teng de, jiyana gelek bîyaniyan kirîye ku êdî hew tête qedandin.

Êve serê salekê ye ku rûniştina demkî (Aufenthalterlaubnis) û carnar ta bi Pasportan ji Ciwan û jinên biyanî û penaberên xwedî rûniştin yên ku mafê wan ye penaberîyê hatiye naskirin, û li şûna rûniştina wan de (Fiktionsbescheinigung) têt dan, ji ber nebûna hatina wan ya diravî ya yasayî, yan jî ji ber jiyana li ser alîkarîyên civakî mîna (Hartz IV)

Dana evan Bilgeyan (Fiktionsbescheinigung) ji hêla Daîreya biyanîyan ve ji evan kesan re wisa tête diyarkirin ku ew kesine nepêbawerin. Ev tevlihevîya bi qesd hin caran dibe rastî gava hinekan dersînor dikin yan jî wan tavêjin zindanên dersînorkirinê. heger ewana dersînor nekin jî, ev tiştên ha bixwe dibe nijadperestî û astengîyê bi qesd ji bo wan kesan.

Pir astengî li ber kesên ku dixwazin rûniştina vekirî yan jî hemwelatîya almanî bidestxin, û anîna jin yan mêr ji derveyî Almaniya, û bi taybetî ji turkîyê, hema hema bû ye ne mumkin ta ji kesên ku xwedîyê nasnemyên almanî ne.

Ji astengên nû yên li pêşîya xortên kêmtemen yên dixwazin rûniştina vekirî bi destxin, xuyadibe ji dibercavkirina diplomêmen wan yên dibistanan û lêpîrsîna li wan li dibistanan. Û ji kiriyarên dersînorkirina di pêşerojê de, derhenana testa taybet ji bo hemwelatîbûnê ji 01.09.2008.

Ya ku nav lédikin yasaya penaberîyê û insiyatifa ku wezîrê hûndîrîn Schäuble di nivê Temûza 2008 an de pêrabû, aramanc jê ewe perçekirina koçberan bo beşê kargêr û beşê nekargêr, di dema bixêrhatina zanyaran dikê, surên Ewropayê li ber milyonan yên ji hejarî û Cengan revyayî digrin.

Ev cihêwazîya nicadî û kiriyarên dersînorkirê di nerîna me de bil ji akamen siyaseta penaberîyê ya ku li ser berjewendîyên xirû aconomî avabûye, tev ku koçber ji salên pêncî de xebateke bêhempa ji bo pêşveçûnên aconomî yê vî welatî dikin.

Ji ber eşkereye ku penebar weke mirovên xwedî mafên sivil nayên dîtin belam weke keşeyeke parastinê û barekî aconomic têne dîtin û li ser vê bingehe danûsandin bi wan re dibe.

Di eyni demê de em biryara ji bo dersînorkirinê ya ku ji alîyê Perlemeto ya ewropayê ya di 18.06.2008 erê kirî de, ew biryara ku rê li ber girtin û dersînorkirina koçberên yên bi asayî ne Qeydkirî xurtir dike, şermezardikin.

Em yên ku li jê imze kirine balê dikşînin ser ku bicihkirina yasaya penaberîyê ya navbihurî, ji hêla Hikûmeta Almanî, û Hikûmeta Berlin ve pinpêkirineke eşkereye û dijî boçunên ku dibêjin ku ev yasa ji bo Integrekirina penaberan di civaka Almanî de ye.

û ew ji Hikûmeta Almanî û ya Berlin dixwazin ku bilez bê bipaşguhkirin van yasayan veguhêre, daku penaber bibin xwedî danûstandinên hevpar û wekhevîyeke yasayî. berdedamkirinê di evan kiriyarên cihêxwaz de ewê nearamî tevlihevîyên ku têne gumankirin di civak û xelkê de xurtir bikin.

Initiative Grenzenlos e.V

El Cielo por asalto

Allmende e.V.

têbînî:

ev daxuyanî wê ta dawîya meha 08.2008 li hemû kesên pêwendîkar û komele dezgeh û sazîyan bête belavkirin ji bo li ser imze bikin. û di meha 09.2008 ji dezgehê hikûmî û dezgehên çapemenîyê re bête şandin. û di eynî demê de ev daxuyanî bingehe be ji bo karê hevbeş ji bo guhertina evan mercan.